1177 VÅRDGUIDEN | REGION KRONOBERG

22 ê Reşemî 2016

Qedexe kirina sunetkirina keçan (FGM) li Swêdê

Divê hemû zarokan li Swêdê li dijî şîdet û êrîşa fîzîkî bêne parastina. Di nav vê qedexe bûnê de hemû awayên sunetkirina keçan (FGM), wekî sinet, dirîn, şewitîn, dirûn, hene. Hemû coreyên kiryarra ne-bijîşkî li ser zayinda jinê qedexe ye.

Hemû zarok divê xwedîyê derfetên tenduristiyê yê herî baş bin. Kiryarrên ne-bijîşkî (sunetkirina, dirîn, şewitîn û dirûn), keçê dêxe bin rîska xwîn rijan û êşa giran û ew dikare bibe sedema enfeksiyonê bo nimûne –enfeksiyona xwînê. FGM ji bo zaroke pirr êş heye, û gengazîya rîska peydabûna pirsgirêkên psîkolojîk heye. Xênjî vê, zaroka tûşî FGM gengaze rastî pirsgirêkên tenduristiyê yên heta hetayê bibe. Pirsgirêka herî zêde ew e ku ew nikare mîza xwe kontrol bike: mîstin demeke dirêj digire û bi êş dibe. Bi mezin bûna temenê keçê û destpêkirina doreyên bênimêjîya keçê, xwîna ku nikare dirkeve, dibe sedema êşeka gelek giran. Ev rewşe dikare bibe sedema serêş, êşa mîdeyê, pişt êş û guhertina taman. Li gel vê, hejmarek ji jinên tûşî FGM yê, tûşî pirsgirêkên cinsî û zehmetiyên ducanî dibin.

Li Swêdê, qanûneke taybet binavê, *Qanûna (1982:316) qedexe bûna sunetkirina keçan*, heye ku hemû cûreyên FGM yê qedexe dike. Pêkanîn, şêwrdan û pêşvebirina FGMyê qedexe ye. Ev qanûne dêbavan dike vekîlê parastina zarokan li hemberî FGM yê. Eger serpereştê zarrok di babeta parastina zarok li hember FGM ê da kêmasî hebe, gengaze li Dadgeha Swêdê bête sûçdar kirin,tevî ku eger kesekî din ev karê pêk bîne û kiryar li derveyî Swêdê pêk bê,
Eger zarokê rûniştîyê Swêdê, li her welatekî û bi destê her kesekî tûşî FGM ê bibe, gengaze ku serpereştê zarok rastî cezayê zîndanê bibe.

Martin Mîrskog Rêveberê Herêmî **Herêma Kronoberg**	Ingrid Burman Serok **Civata Rêveberîya Beşê**	Klas Friberg Serokê Polîsê Herêmê **Rêveberîya Polîs**	Carl-Gunnar Fridolfson Dozgerê Bilind **Rêveberîya Dozgerîya Swêdê**
REGION KRONOBERG	LÄNSSTYRELSEN	Polisen	ÅKLAGARMYNDIGHETEN

Språk: Kurmanji